

Gotinên rêsayî bi têlan



(di bîranîna demsaleke dîn de)

Yasîn Hisên
Amûdê

Vayeîro jî demsal ji nêza dilê te
Li deverên me dimrin
û
ez mîna hunermendekî
têlên tembûra xwe li bejna demsalên te stûr dikim...
ew têlên birçî
xwesteka xwîna tiliyên birçî,,, har,,, dike...!

ew dîwarê reş bûyî ji tûtina çixara min
ew dara zuha bûyî...ji hêstirê min
ev kefenê fireh...ji jiyana min
fireh dibe...giran dibe... li ser sînga min
û
ez mendalek im xwe davêjim sitêrkên şevên te...

vaye dengê min li van girikan belav dibe
kevirên Mîdozza li hawîr dora min serhawe qêrînê dikin
Qijalkên li serê kêlan bang li min dikin:(de tu jî tevî seyrana me
bibe.....û xwe bi me re bike pîrozmend)

Îro....nivîs bê giyane...bêgane ye...
Ji min û te...!
Lêv surgun bûne...
Helbest dikevîne binê çengan...bazbend in...nivişti in...stirî ne...giyanê
nivîsê ne...

Ez xwe û te pê germ dikim..!

Şev ji me vediciniqe

Dema em bê xew dimînin...

Ew şevên sar û qefilî mîna çavê min

Ew şevên tarî û zuha mîna pêçiyê min...

Ew şevên dirêj ...dirêj...mîna xerîbiya me...

Û

Bi destê sibehê re li xwe dilukum im...

Ne demsal...ne sitêrk...ne girik...ne nivîs...nejî şev...

Bêyî het tiştî

Bi destê sibehê re...emê hevdû birevînin...

Û di şeveke dagirtî de emê hevdû himbêz bikin...

Û

Tîna nava xwe bi hev re bişkînin...

Emê sînoran ji helbestan re nehêlin..

Û di tarî şevên xwe de...bi dizî...ji hevdû re bixwîn in...

Ma hîna dê çi bibêjim...

Deh sal ji perîşaniyê têra efsaneyê me nakin...

Tu bi ku diçî,,ez û te em bêrgî hev tîn...mîna hemû kulên me...

ma hîna dê bibim çend tilî...çend tîl...çend kezebreşî...

(dibêjin ku mewîjê serxetê buha bûne...kes nema dikare wan bikire..tew
benî bûne hesret..û tûtin,,aaaaaaax tûtin...tûtina vê demê poza
naşewitîne,,tenê çavan bi hêstir dike)

Ev bedena min e...

De werin fortên xwe di quncika de bi kelînin...

Vaye tiliyên min sipî bûne

Vaye dilê min sivik dibe

Vaye çavên min zuha bûne

De ji min re bipîvin...bê kulên me çendîn dirêj in...

Ew şevên weyî zîz li we pîroz bin...

Ew şevên hîna jî bûne tifik di dilê me de...

Û

Dilê min di qerise bi teniya we re...

Ma hîna hûn çi dixwazin?

Tiştê ku min xweziya xwe bi we ditani,,ta pêçiyê min xûz bûn,,mîna
bedeneke pûşt,, ji çixaran...!

(dibêjin ku xelk vê demê pir dimrin, roj derbas nabin bêyê konên reş û giriyên reş...û rojên reş)

Ew kî ne ewên ku henekê xwe bi me dikin...?
Qey nizanin bê hîna û hîna wê çi bi sere me bê...?
Nizanin bê em li ser çi pîzotê ne...
Em bedenên difroşin...di ruhniyê de
Em pereperestê xwe ne...

De ey demsala min ...a kin...a çavgirtî ...a şil...a tije bi lavlavk û
penîrokan.....de tu jî nebe ji rabirdiwên sextet...
Tu kinê...ji ber tu xweş e..
Lê te çav ji çi girtî ye..?
Te şilîya xwe ji ku anî ye?
Te dilê min bi bihna buhara xwe re kiriye rêwîyê salê...
dilekî rêsayî bi tîlên tembûran...
Her û her serpêhatiyên xwe bi ser sere min de dilorîne...